OM KLÆR I BARNEHAGEN
**KURDISK – KURMANJI**

# DERBARÊ KINCAN
## li zarokxanê



## KINC

Divêt zarok li zarokxanê cilên wisa li xwe bike ku hûn ji qirêjbûn an ji xerabbûna wan netirsin. Divêt êxistin û liberxwekirina cilan hêsan û ji bo xwelivandina zarokî/-ê bi cilan xweş be. Li Bergen pir baran û cewgohurîn e, û dibe liberkirina dirust ya cilan zehmet be. Nabe zarokan sar be, lê ew çalak in û divøt gelek cilan li xwe nekin ku rê li lîstinê û livîn bigire. Karmendên zarokxanê dikarin ji bo hilbijartina cilên ku bi kêrî cewên cuda tên alîkariya we bikin.

## Nîşankirina cilan

Ji bo xwe piştrastkirinê ku zarok cilên xwe yên dirust bibe malê, divêt hûn hemû cilan bi navan nîşan bikin. Nîşaneyên navan ên ku di hundurê cilan de qayîm tê zeliqandin, dikarin li ser înternetê bên hecezkirin. Herwisa mumkin e cil bi rêya tuşekê qayîmav bên nîşankirin.

## Zarok li zarokxanê hewceyî kîjan cilan e?

Dema li derve baran dibare an pir şil/ter dibe zarok hewceyî cilên baranê û cizmê ne. Herdem hebûna destekê hilawîstî yên cilên baranê li zarokxanê tiştekê pir baş be. Dema cilên baranê qirêj dibin, wê bibin malê û bişon.

Divêt her roj solên hundir an solên qomaşî li pê xwe bike. Dibe erd şemitok be, û heke zarok bi tenê bi gorê hatinûçûnê bike dibe zarok bişemite. Dibe jî erd şil be, û heke solên qomaşî û solên hundir li pê zarok nebin pêyên zarok wê ter bibin.





© Trude Haugen



© Trude Haugen



© Nina Honningsvåg Træet

## Cilên zêde

Adî ye ku zarok di dema leyîstinê de li zarokxanê şil û qirêjî bibe. Wê gavê ew hewceyî gohurîna cilan in. Lewra hebûna cilên zêde weke derpî, gore, gorederpî, salwar, biloz û pantol li zarokxanê girîng e. Her navber navber bi rêkûpêkî lê binêre ka ew cilên zêde yên ku zarok hewce ye, hene.

## Di demsala havînê de

Dema cew germ dibe, zarok hewceyî cil û solên siviktir e. Li bihar û payîzê kumekê tenik, û belkî bedleka biharî/payîzî ya bê fero wê minasib be. Dema li derve gelek tav be, divêt zarok kremê rojê yê bi faktorê tavê yê bilind bi xwe re bîne. Weke din, hebûna kumê tavê an kepsekî ji bo parastina serî tiştekê aqlane ye.



© Trude Haugen



© Marte Rosenvinge

## Di demsala zivistanê de

Dema li derve sar be, zarok hewceyî bedleka biharî/payîzî ya germ e. Di bin bedla biharî/payîzî de zarok dikare bilozî û pantolê hirîyê an yê flîsî li xwe bike. Nexwe kume germ, goreyên hirîyê, solên germ û avdij, û lepkên germ girîng in. Li bîra te be ku lepik pir caran şil dibin, ji ber vê yekê bila çend cotên zêde hebin.

## Cilûberg di wî demê ku zarok li derva di erebaneya zarokan de radizê

Di nava rojê de zarokên herî piçûk hewceyî bêhnvedinê ne. Li hinek zarokxaneyan zarok di bin çavdêriya karmendan de li derve di erebaneya zarokan de radizên. Baş e ku kîsekê erebana zarokan hebe, weha hewce nake zarok pir cilan li xwe bike. Heta li zivistanê jî dibe di kîsekê erebaneya zarokan de cilên hirîyê yên teniktir bes be. Heke pirseke we li ser xewa di erebaneyê de hebe bi karmendên zarokxaneyê re biaxivin.

## Tiştê din

Ew zarokên ku poşekî, memikê lastîkî yê zarokan û dibe krêma sexbêriyê bi kar tîne, divêt bidane zarokxanê.

BERGEN
KOMMUNE

Foto forside: © Nina Honningsvåg Træet
Svanemerket trykksak, 2041 0731
Skipnes.no